

## Jîna bo gelên di bin dagirkariya rêjîma Îranê re bû remza azadiya!

Piştî derbasbûna du salan ji destpêka şoreşa Jînayê, gelên bindest hîn di vê xebatê de berdewam in.Xebata mezin ya li dijî gemartirîn dîktatorê ser rûyê erdê, ji bo rizgariya yekcarî li Kurdistanê bi destên keç û jinên Kurd dest pê kir....

dom»R:7






## Xebat

Xebat ev peyva ye ku li dîtingeha her mirovekê xwe bi awayekê nîşan dide û rêyên cuda hene bo xebat kirinê.
Li gor berçavgirtina rewşa Kurd bitaybet li Rojhilatê Kurdistanê, niha rehendên cuda hene ku take Kurd ji wan rehenda ve têkoşînê bike û bo hebûn û neteweya xwe têbikoşe. Renge di heyama salên derbasbûyî de derfet û Meydan ji bo cerbandin ......

dom» R:9

Bideŝtveanîna mafên neteŵî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (478)21-09-2024Buha (1000) Tûmen




## Kurdistan hertim zindî ye

Dîroka neteweya kurd pire li serkeftinên mezin û bi lehengên cesûr re,, beriya peymannameya Sykspco û Lozanê ku di navbera Birîtaniya û Firansa de hate îmze kirin û Kurdistan bi ser du parçan de piştire bi ser çar parçan de hate veqetandin, kurd pir bihêz û xwedî bandor bûn li wî serdemî de, lê herçawan Bêşikçî dibêje kurd paramayê aqilê xwe yê olî ne .......

dom» R:8

# RÊZDAR MISTEFA HICRÎ: HETA GIHÎŞTIN BI ARMANCÊN BILIND ÊN ŞEHÎDAN, KURDISTAN ÇEPEREK AVEDAN Û LISERPÊSEKINÎ YE



Rêzdar Mistefa Hicrî

**Rêzdar Mistefa Hicrî, berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hilkefta 32emîn salvegera terorkirina Dr."Sadiq Şerefkendî" û hevalên wî, peyamek belav kir.**

**Deqa peyamê wiha ye:**

32 sal berî niha û li 26ê Xermanana 1371 a Rojî de, Dr. "Sadiq Şerefkendî", sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, "Fetah Ebdulî" endamê Komîteya Navenmdî ya Hizbê û Nûnerê Hizbê li derweyî welat, Homayûn Erdelan Nûnerê Hizbê li welatê Alman û "Nûrî Dêhkurdî" dostê Hizba Dêmokrat, li Birlîna paytextaê Alman, bi biryara komara îslamî û bi rêya destûpêwendiyên vê rêjîmê, hatine terorkirin.


Destê reş ê tawankar, bi terorkirin û komkujî û bi armancgirtina rêberên tevgera netewî û têkoşerên wê, nekarî astengiyan li ser rêya tevgerê çê bike û bi berewajî, heta dem derbas dibe, tekoşîn û hevxebatiya netewî li Kurdistanê zêdetir geşê dike.

Îsal jî li rewşekê de em wî Rêberê Şehîd û hevalên wî bi bîr tînin ku tevgera netewî-dêmokratîk a Rojhilatê Kurdistanê, bi taybet piştî şoreşa "Jîna"yê, berdewam e û civaka Rojhilat li ser xwest û mafên rewaye xwe pêdegirtir e.




Li 32emîn salvegera "Şehîdên Mîkonosê", em peymana emegnasî û berdewamkirina rêbaza tejî serwerî ya şehîdan dubare dikin û dost û dujminan agehdar dikin ku heta gihîştin bi armanca bilind a Şehîdan, Kurdistan çeperek avedan û liserpêsekinî ye.

**Mistefa Hicrî**
**berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdiustana Îranê**
**26ê Xermanana 1403 a Rojî**



## Tiştê ku divê nifşê nû derbarê Dr.Şerefkendî de bizanibe

dom» R:5



## Ew dersên ku Kurd pêdivîye li şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî" werbigrin

dom» R:10

# Peyaman Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê Bi hilkefta 32emîn salvegera terorkirina “Dr. Şerefkendî” û hevalên wî

**Welatiyên Kurdistanê!**

Li 26ê Xermanana îsal, 32 sal bi ser terorkirina Dr. Sadiq Şerefkendî”, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, “Fetah Ebdulî”Nûnerê Hizbê li Ewropayê, “Homayûn Erdelan” Nûnerê Hizbê li Alman û “Nûrî Dêhkurdî” kesayetiyê siyasiyî yê Îranî û dostê Hizba Dêmokrat, bi destê terorîzma dewletî ya komara Îslamî de derbas dibe. Şeva 26ê Xermanana 1371 a Rojî, “Dr. Sadiq” û hevalên xwe li bajarê Bêrlînê paytexta Alman, piştî beşdarbûna wan li kongireya “International Sosyalîst” ji aliyê davûdestkên komara Îsmaî û bi fermana rêberên terorîst yên Têhranê, hatine terorkirin. Ev li demekê de kevtne ber desrêjiya gullan ku mijûlê gotûbêj û danûstandin li derheq paşeroja siyasiya Îranê û gengeşeya rêyên hevahengîkirina opozîsiyona rêjîmê li pêxema bidestveanîna azadî û Dêmokrasiya gelên Îranê bûn.

“Dr. Sadiq” li rewşa dijwar a piştî şehîdbûna “Dr. Qasimlo”, erkê Sekreteriya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê girte syuyê xwe û karî ne wek mîratgirê rast ê “Dr. Qaqsimlo” xebata şoreşgêraneya Hizba Dêmokrat bi şiyan û kêrhatûbûna xwe berdewam bike, belku şûntiliyên taybetiya xwe jî bi ser birêveberiya Hizbê û tevgera Kurd li Rojhilatê Kurdistanê li wî serdemî de bi cî bihêle.

“Dr. Sadiq”, Hizba Dêmokart ji aloziya siyasî û îdelojîk de parast ku piştî herifandina dîwarê Bêrlînê û hilveşandina Soviyetê li Îran û Rojhilatê Kurdistanê jî tûşî tevgera rizgarîxwaz û aliyên çepan bibû.

“Dr. Sadiq” wek yêk ji berçavtirîn kesayetiyên siyasî li dijî komara Îslamî, li nav çalakvanên siyasiyên opozîsiyona Seranserî Îranê, xwediyê pêgeheke bi hêz bû, bi avayekê ku li heyameke kin de erkê Sikirtêriya Hizba Dêmokrat li stuyê wî bû, gelek hewl dan ku li pêxema komkirina alî û kesayetiyên siyasî yên opiozîsiyonê û her ew yek ji wan sedeman bû ku komara Îslamî , biryara terorkirin û jinavbirîna wî bide.

“Dr. Sadiq” li rewşekê de erkê rêberatiya Hizbê kevte ser mila ku hejmarek guherînên deverî û cîhanê qewimîbû û karlêkerî li ser meydana siyasiya Kurdistanê, dever û cîhanê kiribû. Dawîhatina şerê 8 sale yê Îran û Îraqê û ragihandina agirbestê li sala 1367 a Rojî li navbera wan du dewletan de rewşeke nû anîbû pêş ku berdewamiya tekoşîna Pêşmergane li Rojhilatê Kurdistanê rastî pirsyareke micid kiribû û ew nigeranî li nav têkoşerên Kurd çêkiribû ku bo careke din, şoreşa Kurd bibe qurbaniyê sat û sewdaya Îran û Îraqê.

Li vê rewşê de “Dr. Sadiq” bi hevkariya rêberatiya Hizbê, roleke mezin li qahîmkirina binyata siyasî û şorişgeriyên Hizba Dêmokrat hebû û wêrekî û îmana Hizba Dêmokrat a bi berdewamiya xebatê li pêxema bidestveanîna daxwazên rewaye gelê me de bi bilind hişt.

“Dr. Sadiq” li wêjmana siyasiya xwe de digel aliyên siyasiye Îranî de gelek bi zelalî pêdegirî li ser mafên netewiye Kurd dikir û mercê Hizba Dêmokrat bo çonqa nav her hevpeymaniyekê, îtirafkirina fermî ya aliyên siyasî bi mafên netewî ve girê dida.


“Dr. Sadiq” li tenişta girîngîdan bi pirsa netewatî û xweparastin ji vê menca sosiyalistiya cîhanweteni bi taybet li dehika 60an de bi ser kêşiya siyasî li Kurdistanê de giranî dikir, baweriya kûra xwe û Hizba xwe bi dadpeweriya civakî, nediveşart.

**Hogir û emegdarên riya Şehîdên Kurdistanê!**

**Kor û komikên navnetewî yên alîgirên mafê mirov!**

Terorkirina “Dr. Sadiq Şerefkendî” û hevalên wî, tevî ku derbeke mezin bû ku bi tevgera Kurd û bi taybetî Hizba Dêmokrat û xebata gelên Îranê bo azadiyê kevt, li hemen demê de bi sedema vê ku yekem car, dosyeya hiqûqî û dad li dijî komara Îslamî bê vekirin û tê de biryareke bivêrane û bê mînak, dadgeheke Ewropayê, berpirsên herî payebilind ên komara Îslamî bi tawanbar nas bikin. Komara Îslamî berî terorkirina “Dr. Sadiq Şerefkendî”, gelek çalakvanên siyasî û rêberên opozîsiyonê li welatên Ewropayî de teror kiribûn, ew li demekê de ku li ti yek ji wan tawankariyan de bi berpirsyar nehatibû zanîn, lewma biryara dadgeha Mîkonosê û bi tawanbarnaskirina rêberên rêjîmê li her du warên siyasî û hiqûqî yê girîng û cihê lêhûrbûnê ye û bi destkevteke mezin bo Hizba Dêmokrat û tevgera mafxwazane bo xelkê Kurdistanê û hemû azadîxwazan tê zanîn.

Tevî binçavkirin û sizadana hejmarek ji biker û pîlandarêjerên tirora li Mîkonosê, ew dosye heta niha jî vekirî maye û biryarder û tawanbarên bingehîn ên vê tawanê, heta niha jî nehatine sizakirin. Pêka hikmê dadgehê, biryara girtina “Elî Felahiyan” ê wezîrê îtilaat a rêjîmê li vê serdemê hate dan û navbirî tevî ku heta niha jî li dadgehê de amade nebûye, berpirsên curbicurên li nav rêjîmê de pê dane. Ji aliyê din ve, dadeghê Elî Xamineyî yê rêberê olî yê rêjîmê, Refsencanî ê serkomarê rêjîmê yê vê demê û Wilayetî yê wezîrê derve yê rêjîmê, wek biryarderên binghehîn ên terorkirina li mîkonosê dane nasandin û vê yekê jî wa kir ku ji warê dadweriyê ve dosyeya wan li dadgehê de bi vekirî bimîne û dadgeh hatiye erkdarkirin ku li dema pêşhatina derfetê, wan tawanbaraên bikêşe ber dadgehê bo evê ku qedera vê dosyê bê yêkalîkirin. Li




vê derheqê de em hivîdarin ku bi xebat û tekoşîna hemûalî û li rewşa niha ya komara îslamî de careke din hewlên bi rêxistina dosyeya Mîkonosê û gihîştin bi encama yekcarî bêne dan.

**Xelkê Xebatkarê Kurdistan û Îranê!**

Bihêzî û micidbûna hikmê dadgeha Mîkonosê, komara îslamî neçar kir ku heta qaseke berçav bo heyamê çendîn salan xwe ji terorkirina cudabîran û çalakvanên siyasî li welatên Rojavayî û bi taybet li welatên Ewropayî de biparêze. Hevdem dosyeya Mîkonosê û hikmê dadgehê li warê navnetewî de şûndaneriyên cur bi cur li pey xwe anîne û li civaka navnetewî de karlêkerî bi ser rewatiya rêjîmê de danî. Bo yekem car, dadgeheke ewropayî rêberên rêjîma îranê bi tawanbar naskirin û vê yekê jî rasterast rewatiya hemû rêjîma Îranê birê jêr pirsyarê bi şêwazekê ku hemû welatên Ewropayê piştî biryardana dadgeha Mîkonosê, balyozxanên xwe ji Têhranê vexwandin. Ew biryara bi sizakirina tevahiya desthilatdariya rêjîma Îranê tê hijmartin û belgeyên selimandî li ser qutbûna pêwendî digel rêjîmeke neberpirs û serberedayî ku destdirêjî bi ser nirxên bilind ên civaka navnetewî yên wek destdirêjî bo ser jiyana mirovan li derveyê dadgehê, destêverdan li karûbarên navxweyî û binpêkirina serweriya dewleta Alman kiriye.

Tevî sat û sewdayên siyasî û bazirganiya welatên Ewropayê digel rêjîma Îranê û girtinaber xwe ye gotûbêjên rexnegirane bû sedema vê ku li demeke kin de balyozên xwe bişînine Têhranê û pêwendiyên xwe asayî bikin, lê li rastiyê de şûndaneriya wan sizayane wek karnameyeke reş li dîroka komara Îslamî de maye û li qonaxên cuda de bandor li ser helwîstên civaka navnetewî li hember komara îslamî de bike. Cehdên Yekîtiya Ewropayê bo bi terorîstnasandina spaha pasdaran, wek biryara Parlemana Ewropayê bo zêdekirin li lîstê terorê a vê Yekêtiyê û hevpeyvîn û helwêstên hejmarek ji welatên Ewropayî li vê derheqê de berhema şiltaxiyên navnetewiyên komara îslamî û yek ji wan terorîsma navnetewî ya vê rêjîmê ye ku li dadgeha Mîkonosê de bi rohnê pêdegirî li ser hatiye kirin.

Komara îslamî bi terorkirina rêberên Hizba Dêmokrat bi taybet “Dr. Qasimlo” û “Dr. Şerefkendî”, nek her nekarî îrade û baweriya Hizba Dêmokrat û gelê Kurd li rojhilatê Kurdistanê li xebat li pêxema bidestveanîna daxwaziyêpn xwe yên rewa lawaz bike, belku evîndarên Qasimlo û Şerefkendî, roj bi roj pêdegirtir bi pêngawên qahîmtir ber bi armancên xwe ve diçin. Tevgera giştî ya “Jin Jiyan Azadî”, Newroza axabaniyan û 2 car bi dengvehatina xelkê Kurdistanê bo baykotkirina hilbijartinên meclî û serkomariya rêjîmê li 2 salên derbasbûyî de îşareyeke bihêz û eşkere ji emegdarî bi rêbaza Hizba Dêmokrat û rêberên şehîd hate dîtin.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li salvegera terorkirina Şehîdên Mîkonosê, bi taybet “Dr. Sadiq Şerefkendî”, rêberê xwedîbandor ê xebata netewiya gelê me li Rojhilatê Kurdistanê, pêdegirî li ser binyatên negor ê xebata netewiya gelê Kurd dike û hivî dike ku gelek nekêşe ku serokên rêjîma tawankar û mirovkuj ên komara îslamî li dadgeheke dadperwerane ya gelên Îranê bigihîjin sizaya tawankariyên xwe yên bê sînor.

Li 32emîn salêvegera terorkirina“Dr. Sadiq Şerefkendî” û hevalên wî de em silavan bo rihê paqijê wan dişînin û rêz ji xebat û baweriya wan bi azadiya gelê Kurd û netewên din ên Îranê digrin.

**Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**25ê Xermanana 1403 a Rojî**

# Peyama Navenda Birêveberiya Giştiuya Hizbê bi hilkefta duyemîn salvegera tevgera Jînayê

2 salan berî niha û li 25ê Xermanana 1401 de kuştina keçeke Kurd a xelkê bajarê Seqizê ya bi navê "Jîna Emînî" ji aliyê geşta îrşad a rêjîma komara Îslamiya Îranê li bajarê Têhranê, bû sedema serhildana tevgereke giştî ku bi tevgera "Jîna"yê hate naskirin. Tevgera Jînayê ku li Kurdistanê û bi diruşma serekiya "Jin Jiyan Azadî"yê dest pêkir, bi lezgînî piraniya bajarên Îranê û bi taybet li deverên netewên mafzewtkirî li welat girte ber xwe û pel havête nav şeqam û meydanên giştî yên welatên derve û bala gelek ji kor û komên navnetewî bo aliyê xwe rakêşa.

Tevgera Jînayê ku berhema xebata ji mêjve ya mafxwazaneya xelkê Kurdistan, teqîna kerb û bêzariya xelkê ji rêjîmê û lêkevtên pangurî yên xwest û daxwziyên bersivnedayî yên 10an salan a piraniya gelên Îranê û bikêrnehatîbûna desthilatê û hevdem serkuta sîstematîk a komara Îslamî bû, cihê serîhildana vê Kurdistan bû. Bi wateyek din, tevgera Jînayê li Kurdistanê de serî hilda û bi vê diruşma serekiya xwe ku li şeqamên Kurdistanê de hatibû hildanê, li bajar û deverên din ên Îranê de belav bû û her bo piştevanîkirina Kurdistanê jî bû li destpêka tevgerê de xelkê cihê din ên Îranê beşdarî kirin. Ev bo Kurdistan û tevgera mafxwazaneya vê ku dehan sal bû bi dîêtingeheke ewlehî vê dihate mêzekirin û bi dehan buxtan û tohmetên narewa lêldabûn, derfeteke zêrîn a siyasî bû.

Reftar û helwîsta mukumane a xelkê Kurdistanê û peyamên vê tevgerê li şeqamên Kurdistanê bi qasek modern û mafxwazane û şaristanî bûn ku xelkê cihên din ên Îranê bi diruşmên "Kurdistan Kurdistan Em piştevaniy li te dikin" û "Kurdistan Kurdistan çav û çiraya Îran"ê beşdarî li vê tevgerê de kirin. Ev lêkevt û karlêkeriyane bo rêjîma komara îslamiya Îranê ku her ji destpêka hatineserkara xwe ve li hember Kurdistanê û daxwaziyên siyasî û netewiyên vê siyaseta dijîgel û ewlehî girtibû ber xwe û bi dehan sal bû li ser lekedarkirina kesayetiya Kurd û pirsên siyasiya kurd kar kiribû, nedihate qebûlkirin. Lewma bi dariştina pîlanên hemûalî yê odeyên ewlehî bi kodremza "tecziye telebî" hevdem digel poropagendayên berfireh ên teblîxatî û rêkxistinkirina artêşa saybêrî bo êrîşkirin ser naveroka tevgerê û girêdana vê bi destên derekî, rê bo serkuta bi xwîna şoreşvanên ser şeqamên Kurdistanê û êrîşa mûşekî bo ser binke û bargehên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê û hizb û aliyên din ên Kurdistanê xweş kir.

Armanca komara îslamiya Îranê li vê serkutkirin û êrîşane bi taybet êrîşkirina bo ser Hizbên siyasiyên Kurdistanê, jirêderxistina hizra giştî ya xelkê deverên din ên Îranê, peydakirina hêcetê bo serkuta zêdetir, tirsandina xelkê û beşek ji aliyên opozîsiyona li wehma "hilveşan û dabeşbûna Îranê" bû ku her wek hate îşarekirin, rêjîmê bi kodremza "tecziye telebî" pîlan bo dariştibû.

Xelkê Îranê bi yekîtî û bi beşdariya hemû parên civakê û piştevanîkirina Îraniyên li diyasporayê zêdetie ji 3 heyvan, tevî berdewamiya serkutkariyên rêjîmê ku bi sedan kes şehîd û birîndarbûna hezaran kes û girtina dehan hezar kes li xwenîşanderan li pey xwe anî, li tevgera Jînayê de bi berdewamî li ser şeqam û meydanên curbicur xebat li dijî dîktatoriyê û serberedayîya komara îslamî de bûn. Tevî ku tevgera "Jin Jiyan Azadî"bi sedema hinek sedemên bingehîne derveyî û pêwendîdar bi bereya opozîsiyonê bi armancên bingehîn ên xwe anku, guherînên binyatî û avakirina Îraneke nû negihîşt, lê her wek li şorovekirinên Hizba Dîmokrat a Kurdiustana Îranê de hatiye, "mezintirîn û bihêztirîn tevgera nerizazyetiya medenî li dîroka desthilatdariya komara îslamî de bû ku çi li navxwe û çi li nav îraniyên derveyî Îranê ji aliyek vekhevî û hiviyeke zêde li nav xelkê de afirandibû û komara îslamî gelek tengav kir û ji aliyê din ve jî, dengvedana vê serîhildan û tevgerê li asta civaka navnetewî, kor û kombûnên siyasî û torên civakî de bala raya giştî ya cîhanê bo aliyê xwe rakêşa.

Li cihê xwe de ye ku li 2 saleya serhildana tevgera Jînayê de û li pêxema ceribandinekê bo paşeroja tevgerê de bi mêzekirineke xisarnasane li vê bûyera dîrokî ya tevgera mafxwazaneya gelên Îranê li dijî dîktatoriya olî ya komara îslamiya îranê, li çend xalan de em bas ji kêmasî û kemûkoriyên vê tevgerlê bikin:

**1**- Civaka Îranê tevî sitem û zordariya desthilatê, bi qasa hewce li yekgirtin û bihevrebûnê negihîştine vê yekê ku hêz îradeya giştî li dijî dîktatoriyê bikin yek û bo armanceke hevpar hewlê bidin, Ku tevgera Jînayê de gelek ji par û qatên civakê li bajar û deveran hatibûne meydanê lê li rastiyê de nekarî bigihîje bi piraniyê giştî ku paşekêşiyê bi rêjîmê bide kirin. Li vê derheqê de hejmarek sedemên binyatî û veşartî hene ku hewceye em mêzeyî wan bikin û bi rêkxistin û çêkirina hişmendiyê wan li faz û li civaka giştî de gihîştin bi jiyaneke modern û mafxwazane rêkxistin bikin.

**2**- Nebûna alternatîvê bo komara îslamî yek ji wan sedemên bingehîn e ku mixabin niha jî ew rêjîma li ser pê ragirtiye. Li pêvajoya tevgera Jînayê de opozîsiyona Îranê li derveyî welat, ne tenê nekarî bi qasa hewce bibe hêvîderê tevgerê û handana xelkê bo yekgirtin û man li meydanê de, belku bi berwajî bû xala lawaz a tevgerê! Û bereya opozîsiyona Îranê bi hegarên durkevtin ji civak û xwestên xelkê û ji hemûyan girîngtir çeqîn û man li mêzekirin û wêjmana tevaviyetîxwazî û înkarkirina çendîn netewî û curbicuriya pêkahetya Îranê û amadenebûn bi hizra dabeşkirina desthilat û pêdagirî li ser santralîzmê, bi kiyrar berwajiyê rastiya siyasî li welat û peyamên tevgera Jînayê pêngav hilda. Derbasnebûna opozîsiyonê li hûrdepirsgirêkên nav rêkxirawî û geriyan li nav pirsgirêk û gotarên biyanî bo nivşa nû, bûye sedema hitbarnekirina xelkê bi vê rewt û aliyan. Her lewma wa tê dîtin ku xelk li paşerojê de bi sedema xirabî û bêhivêbûn ji opozîsiyona derveyî welat, li navxweyê welat de bala xwe bidine ser pirsa alternatîv û çêkirina cihgir bo vê rêjîmê.

**3**- Li asta hizb û aliyê Kuyrdistanî de jî tevî ku Hizbên Kurdistana Îranê hem li warê meydandarî û hem li warê wêjmanî de karîn li civak û xelkê xwe nêzîk û bi roj bin, lê pêvajoya tevgera Jînayê de derket ku bê pirsgirêk û kêmasî nîne. Li destpêkê de Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê ku piştre bi sedema pirsgirêk û dijayetiya reftarî û wêjmaniya endamên xwe kevte rewşa ragirtinê, rolek baş û karlêker li tevgera Jînayê de hebû. Lê mixabin bi sedema hejmarek dîtingehên dûr ji rastî û pêngawên bi leze ên tekrewane ku Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ji destpêkê ve bê encamî û xisarên vê pêşbînî kiribûn û li vê derheqê de bi rohnî helwêst girt, wek hewce ji vê derfeta ku bo tevgera siyasiya Kurdistanê hatibû pêş bi tevavî mifah nehate vergirtin.

**4**- Şirove û helwîstên civaka navnetewî û bi tybet welatên Rojavayî ku dibe li 2 qonaxan de bas jê bêkirin, wek li pêwendiyên li 2 dehikên derbasbûyî digel komara îslamiyua Îranê li ser pirsa navkî de derkevt û bo Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê çavrêkirî bû, tevî vê ku li nzîk ve bûyerên Îranê û tevgera Jînayê çavdêrî dikirin, lê derfet û bijardeya guherîna rêjîmê û derbasbûn li komara îslamî li vê pirsê de nedidîtin. Bertengî û bertengmana piştevaniya welatên Ewropayê li çarçoveya rûniştinên wan digel çend sêlbrîtiyan ku beşekê pêwendî bi nebûna alternatîva rast û bi bername hebû, ew rastî da selimandin ku tevger wekî hewce, piştevanî jê nayê kirin.

Tevî hemû îşarepêkiriyan û gelek sedemên din, serkuta dirindaneya hêzên ewlehî û serkutkarên din ên komara îslamiya Îranê jî bo tevgera Jînayê tejî xisar û nirxdanê bû, bi sedan kes li ser şeqaman hatine şehîdkirin, bi dehan hezar kes birîndar û hatine girtin, bi armanca tolhildan ji beşdariya berçav a xwendevana, hezaran xwendevan bi taybet keçên xwendevan, hatine jehrîkirin ku heta niha jî ew serkutkariyane bi sepandina sizayên girana û heta bidarvekirina berdewam e.

Li tevgera Jînayê de ku rûkê siyasiyê Kurdistan û Îranê guherî, rola malbatên şehîdên tevgera Jînayê, bazarî û dukandaran, pizîşkan, mamstayan, kesayetî û




bijartiyên siyasî û civakî, jinan, ciwanan, xwendekar û xwendevanan, mamstayên olî yên xwedîhelwîst li Kurdistanê û herwisa Kurdên diyasporayê li derveyî welat û bi nirx bû ku Hizba Dêmokrat hem bi qîmetê ve mêze dike û hem bi hewce dizane ku li paşerojê de baştir jî şiyan û bikêrhatina wan bo bi pêşxistina pirsa qatên cuda yên civakê û rêkxistin û hevxistina hêza xebatkariya wan mifahê verbigre.

Hizba dêmokra a Kurdistana îranê li duyemîn salvegera tevgêra Jîna yê de bi armanca bilind û zindîragirtina wê tevgêrê û peyamên mafxwazaneye cemaweriyên wê, daxwazê li tev qat û texên civatgeha Kurdistanê, civaka medenî û rêkxistinan dike bi heçî avayekê ku ji dest wan tê û bo wan çêdibe, li rojên taybet bi wî hilkeftê çalak û meydandar bin.

Her li wê derheqê de bi diyarîkirî em radigehînin, bila ji rêka mangirtina gistî ve li tev bajarên Kurdistanê li roja Yêkşemiyê 25ê Xermananê, bo carekî din tevî bilindragirtina yad û bîreweriyên şehîdan û qurbaniyên tevgêra Jînayê, tekezî li ser peyamên wê tevgêrê bête kirin.

Bo vê armancê em daxwazê li gelên dine ye Îranê dikin ku li pêxema yêkîtiya seranserî bi dijî siyaseta tepeserkarane û serberdayîya koma îslamiya Îranê, li wê derfetê de hevhelwêstî û piştevaniya xwe bo zindîragirtina peyamên tevgêra Jînayê bidne xuya.

Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li yada serîhildana tevgera Jînayê de tevî bilind ragirtina rol û beşdariya tevahiya çîn û qatên civaka gelên Îranê şandina silavan bo qurbaniyên vê tevgerê, pêdeçon û balkêşandin bo ser kêmasiyan û bihêzkirina xalên erênî li çarçoveya dîtina hêz û potansiyela vê li civakê û yekîtiya li navbera hêz û aliyên siyasî û civaka medenî li navxweyê welat bi armanca peydakirina derfetan, bi girîng û hewce dizane. Her li vê derheqê de Hizba Dêpmokrat tevî amadekirina rêkar û platforma taybet bi berçavanîna Îranê li paşerojê, amadehiya xwe bo hevkarî û hevpeymanî digel hêzên pêşkevtinxwaz û dêmokratên navxweyê welat radigehîne.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Navendea Birêveberiya Giştî**
**Xermanan a 1403 a Rojî**

# Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê spasnameyek bi boneya birêveçon a mangirtina giştî ya xelkê Kurdistanê, belav kir



**Xelkê têkoşer û xwedî helwîst ê Kurdistanê!**

Roja Yekşemî 25ê Xermananê, we xelkê xwedîhelwêst bi birêvebirina mangirtina li beşeke berçav ji bajarên Kurdistanê, careke din zindîbûna tevgera "Jin Jiyan Azadî"yê bo hemû aliyan da selimandin û da nîşandan ku Kurdistan çepereke qahîme û nayê girtin e û bo gihîştin bi mafên xwe, bê sekinîn li xebata xwe berdewam dibe, bi vê boneyê, Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat bi dil û can spasa xweragirî û berdewambûna we li meydanê de dike û mandînebûniyê dibêje we.

**Xelkê xweragirê Kurdistanê!**

Birêvebirina mangirtina we li vê rojê de li halekê de bû ku rêjîma komara îslamiya Îranê bi hemû hêza xwe û bi tevahî, Kurdistan milîrtarîze kiribû û hemû hewlê xwe dan ku rêgirî ji berfirehbûna mangirtinê bigre. Navendên sîxurî yên îtilaat û spaha pasdaran li çend heftiyan berî niha ve bi binçavkirina çalakvanên medenî û malbatên şehîdan li hewlê de bû ku şikestê bi tekoşîna we li vê rojê de bîne, heta li vê rojê de îzna derketina ji malê nedane malbata "Jîna Emînî" ku serdana gora keça xwe ya şehîd bikin. Lê tevî hemû tundûtîjî û givaşekê, dîsan îradeya yekgirtî ya we xelkê Kurdistanê bi ser hemû tundutûjiyeke komara îslamî de bi ser kevt.
Li duyemîn salvegera tevgera "Jîna"yê de helwêsta we ya bivêrane û meydandariya we, nîşanderê vê rastiyê bû ku ev tevger her wa zindî ye û heta serkevtina yekcarî bi ser dîktarorên xwesepandî bi ser Kurdistan û Îranê, xebata xwe berdewam dike.
Careke din spas ji we dikin û bo îrade û baweriya we silavan dişînin.Silav li şehîdên serbilind ên niştîman û girtiyên siyasî û malbatên wan ên serbilind.
**Serketin bo tevgera mafxwazaneya Kurdistanê Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê 26ê Xermanana 1403 a Rojî**

**Peyama PSK-Partiya Sosyalîst a Kurdistan bi hilkefta 32 emîn salvegera şehîdbûna Dr. Şerefkendî û hevalêt wî**

**Dr. Şerefkendî û hevalên wî nemir in**

Li ser şehîd kirina Sekreterê Hizba Demokrata Kurdistana Îranê (HDKÎ) Dr. Sadiq Şerefkendî, Nûnerê HDKÎ li Ewropa Fetah Abdulî, Nunerê HDKÎ li Elmanya Humayun Erdalan û şoreşgerê îranî û dostê HDKÎ Nurî DêhKurdî, li Berlinê, bi destê nokerên Dewleta Cumhuriyeta Îslamî ve, 32 sal derbas bûn.
Şehîd kirina Simkoyê Şîkak jî nişan dide, ku şehîd kirina rêberên siyasiyên Kurd bûye bingeha siyaseta dewleta Îranê. Şehid kirina Dr. Şerefkendî û hevalên wî ji aliyê Cumhuriyeta Îslamiya Îranê ve berdewamiya siyasete hanê a teroristî ye.
Ne tênê rêbêrên Kurd her usa gelek kesayetiyên demokrat, ronakbîr û dij rejimê jî bûne armanca vê siyaseta teroristî ye.
Lê belê cudatiyeka mezin heye di nava şehîd kirina Dr. Şerefkendî u yên dinê da.
Dadigeha Berlinê bi biryarê xwe va, rejima Cumhuriya Îslamiya Îranê û berpirsên rejimê yên vê demê, wekî Wezirê Îtilatê Elî Felahyan, Rêberê Olî Ayetullah Elî Xameneyî, Serokkomarê Îranê Refsancanî û Wezirê Derveyê Îranê Wilayetî, plandanerên cinayeta hanê nasand û biryar daye, ku kesên hanê heya, ku werine dadigeh kirinê, dosya vekirî bimine.Biryara Dadigeha Berlinê biryareka biwêrene bû, ne tenê rejima Cumhuriyeta Îranê wekî rejimeka teroristî nasand, her usa vê rejimê di qada navnetewî da xiste tengasiyê.
Dewleta Îranê, ku dixwaze bi kuştina rêberên Kurd ve pêşiya xebata azadiya gelê Kurdistana Rojhilatê bigre, bi şehîd kirina Dr. Şerefkendî û hevalên wî ve jî negihişte armanca xwe. Çawa bi şehîd kirina rêbêre mezin Qasimlo ve xebata HDKÎ nesekini, bi berovajî geştir û bi heztir bû, paş teror kirina Dr. Şerefkendi, tekoşina HDKİ ber bi pêşve çû. Tevgera "Jin Jiyan Azadî", serketina siyaseta boykot kirina hilbijartinan li Kurdistanê nişana vê rastiyê ne.
Em di salvegera 32êmin a şahedeta Dr. Şerefkendî û havelên wî carekî dinê Cumhuriyeta Îslamiya Îranê protesto dikin.
Em banga hêzên siyasiyên Kurdistanê dikin, ku bi kelk vergirtina biryarên Dadigeha Berlinê ve, bona dadigeh kirina berpirsên vê demê a dewleta Îranê, destê xwe bidine hevudu.Em piştrast in, ku hevsengerên Dr. Şerefkendî, heya serketinê sengera xebatê çol nakin, alayê şehîdan bilind radigrin.
Em li ber hizura şehîd Dr. Şerefkendî û hemu şehîdên Kurdistanê qirnoş dibin.
**Ruhê wan şad rêbaza wan berdewam be. 16 Îlon 2024 PSK-Partiya Sosyalîst a Kurdistan**

**Partiya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) li 32emîn salvegera şehîdên Mîkonosê", daxuyaniyek belav kir**


**Li 32emîn salvegera terorkirina Dr."Sadiq Şerefkendî" û hevalên wî ji aliyê rêjîma Îranê, Partiya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) daxuyaniyek belav kir.**

**Deqa peyamê wiha ye:**

Em Dr. Sadiq Şerefkendî û healên wî bi rêzdarî bi bîr tînin
Sekreterê Giştî yê PDK-Îranê Dr. Sadiq Şerefkendî, di 17yê îlona sala 1992an de, li bajarê Berlînê, li welatê Alman, li gel endamê Komîteya Navendî û nûnerê derveyî welêt yê PDK-Îranê Fetah Ebdulî, nûnerê PDK-Îranê yê Almanyayê Homayûn Erdelan û dostê PDK-Îranê Nûrî Dêhkurdî, bi emrê dewleta Îranê, ji aliyê sîxurên Dewleta Îranê ve hatin şehîd kirin.
Em Dewleta Îranê careke din jî ji ber vê kuştina siyasî rûreş û şermezar dikin.
Dewleta Îranê bi îdamkirina pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî, bi şehîdkirina Dr. Abdulrahman Qasimlo û hevalên wî, bi şehîdkirina Dr. Sadiq Şerfekendî û hevalên wî jî nikarî rê li ber doza azadîya gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê bigre.
Ew alaya ku di ragihandina Komara Kurdistanê de, li Meydana Çarçiraya Mihabadê hatibû hildan, îro li Rojhilatê Kurdistanê û li her perçeyekî Kurdistanê bi destê xebatkar, kedkar û têkoşerên doza azadîya Kurdistanê bilind e.
Di 32yemîn salvegera şehadeta wan pakrewanan de, em Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî û hemû şehîdên Kurdistanê bi rêzdarî bi bîr tînin.

**Buroya Ragehandinê ya Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK)**
**17ê Îlonê 2025**
**26ê Xermanan a 1403 a Rojî**

# Tiştê ku divê nifşê nû derbarê Dr.Şerefkendî de bizanibe






N. Dr. Mecîd Heqî

**Nêrînek li taybetmendiyên rêbertiya Dr.Seîd Şerefkendî**

"John Adams" dibêje: "Gava ku hûn bandorê li ser mirovên din bikin ku bêtir bifikirin, bêtir fêr bibin, bêtir bixebitin û çêtir bibin, hûn rêber in."

Di dîroka neteweya kurd de serok û qehremanên ku derketina wan bi nakokî û pirsgirêkan re hevdem bûye, hebûne. Siwarên tekane yên ku hatine û pevçûnan birêxistin kirine û ji bo gihîştina lûtkeya mirovatiyê û têkoşîna azadiyê û bi destxistina mafên xwe yên mirovî û neteweyî rêberî kirine.

Şervanên ku di şert û mercên pir dijwar ên dîrokî de karîbûn hêz û enerjiyê bidin tevgera neteweyî û îspat bike ku ya ku dibe sedema têkçûna tevgera neteweyî ne jidestdana xwebawerî û hêzê ye, ne windakirina rêberên jîr û bihêz.

Seîd Şerfkendî di rewşek dîrokî ya gelek hestiyar de di tevgera neteweyî ya Rojhilatê Kurdistanê û jiyana siyasî ya partiyê de serokatiya PDKê girt ser milê xwe, di kêmtirî sê salan de, wî karîbû hemû hêviyan bikişîne ser partiya di bin serokatiya xwe de û Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê tevî jidestdana Dr.Qasimlo karibû partiyek çalak, proaktîv û nûjen bimîne:

**1.** PDKÎ hêza sereke ya berevaniya çekdarî li hember Komara Îslamî bû û erka dijwar a serkêşiya têkoşîneke berfireh a siyasî, sivîl, çekdarî û dîplomatîk bi cih anî. Bi bidawîhatina şerê Îran û Iraqê re, Komara Îslamî ya Îranê karî gelek caran hêzên xwe bo serkutkirina berxwedana çekdarî ya gelê Kurd û tevgerên navxweyî yên Îranê kom bike.

**2.** Bi sedema cudabûna piştî kongireya heştem a partiyê û pirsgirêkên pê re, PDKÎ rastî astengiyên navxwe û rêxistinî û alozî û heta rawestana rewşa siyasî û çekdarî ya wê demê hat.

**3.** Şerê birakujiyê yê di navbera Komale û PDKÎ'ê de hîn neqediyabû û ji ber wê jî partiyê li gelek eniyên cuda û bi stratejiyên cuda şer dikir.

**4.** Operasyona Enfalê ya hikûmeta Seddam ji bo partî û tevgera neteweyî ya Rojhilatê Kurdistanê qeyraneke mezin a exlaqî, siyasî û hestiyarî çêkiribû.

Di vê rewşa awarte de, kesekî asayî wek Dr.Şerefkendî bi taybetiyên xwe yên taybet û rêbaza xwe ya serkirdayetiyê, derfetên nenas diafirîne û Hizba Demokrat a Kurdistanê ber bi serkeftinê û derbaskirina asteng û kêşeyan ve dibe.

Dr.Şerefkendî, wek rêvebirekî bihêz, ne tenê hizir dikir ku partiyê di "tevgera heyî" de bihêle, lê wek rêberekî geşbîn bi hemû hêza xwe hewl da ku partiyê bi lez û bez ji rewşa berxwedanê ber bi dewleteke çalak veguhêze û bibe sedema guhertinê.

Di vê gotarê de bi kurtî li ser kesayetî û taybetmendiyên serkirdayetiya Dr.Şerefkendî tê tehlîlkirin, da ku sedemên tirsa Komara Îslamî ya Îranê ji bilindbûna rêberekî nû û nifşekî nû di nav tevgera neteweyî ya Kurd de ji perspektîveke din were dîtin.

Organîzma mirov xwedî taybetmendiyên cihê ye ku ev cudahî di berfirehkirina kesayetiya mirov de xwedî girîngiyeke taybet in. Kiryarên mirovan bi gelemperî sedemên cûda hene û dikarin ji kesek bi kesek cûda bibin. Mirovên cihê dikarin di derbarê çalakiya kesek taybetî de xwedî raman û têgihîştina cûda bin.
Ev tevlihevî li gor bîr û baweriya mirov, ne tenê ji ber kesayetiya ferd e, belku ji ber şert û mercan û heta têkiliya taybetiyên mirov bi rewşan re ye û dibe sedema zelalkirina hêz û lawaziyên wî. Armanca me di vê gotarê de ev e ku em bibînin ka têkiliyek di navbera taybetmendiyên kesane û şêwazên serokatiyê yên ku li jor hatine destnîşan kirin de heye.

Şexsiyet, taybetiyên mirov ên der û xuya dike. Ji ber vê yekê kesayetiya mirov di çarçoveya cihên ku em li ser yên din hene têne analîz kirin. Di vî warî de meriv dikare bi kurtasî taybetiyên mirovî wiha bêne ravekirin: Hêrs (Rwan Ronjur Xoyî): Kesên bi kelecan, ne aram, bi hêrs û bi berdewamî di lezê de ne.

Derwetî: Kesên ku taybetmendiya mirovan in, kesên ku kêfa wan ji axaftin û gerandina bi mirovan re tê û bi mirovan re dilşewat in. Vekirî: Kesê ku bi dilekî pak, dilsozî, sadebûn û edebî tê naskirin. Task oriented: Kesên ku rast, pêbawer, çalak û rêkûpêk in.

Di şert û mercên ku Dr.Şerefkendî bi erkê serkirdayetiya Partiya Demokrata Kurdistanê hatibû spartin, taybetmendiyên wî zextên derûnî yên bi wendakirina Qasimlo û hevalên wî, rûbirûbûna şikestin û şikestinan û reftarên serkirdeyên partiyên din nîşan didin.

**Şêweya Rêbertiyê**
Li gorî van taybetmendiyên jorîn, sê şêwazên serokatiyê dikarin werin analîz kirin: Şêweya afirandina peywirê, ku li ser hewcedariyên civakî û derûnî yên endam û rêvebirên rêxistinê radiweste. Di şêwaza danûstendina afirîner de, rêber balê dikişîne ser pêkanîna peywiran ji bo bidestxistina armancên rêxistinê û di dawiyê de şêwaza hevrêzî ya ku tê de rêber hem li ser encam û hem jî li ser hewcedariyên civakî, derûnî yên endam û rêvebiran disekine ku bigihîje armancan.
Reftara neyînî ya rêber li hember kadro û endaman pir caran dikare ji rêxistinê re şopên wêranker û bêserûber bihêle. Ji ber vê yekê, taybetmendiyên taybet ên rêber û şêwaza rêveberiya wî bandorek mezin li ser paşeroja rêxistinê û pêşveçûn an lawazbûna wê dike. Li ser şirovekirina taybetmendiyên Dr.Seîd, em dikarin zêdetir sedemên tirsa Komara Îslamî ji hebûna rêberekî wek Şerefkendî piştî Dr.Qasimlo bibînin:

**Sempatî**
Sempatî ne xisleteke cewherî ye ku her kes nikare bibe xwediyê wê, lê ew taybetmendiyek ku dikare wekî hemî taybetmendiyên din were pêşve xistin. Taybetmendiyeke balkêş a Dr.Seîd nermbûna wî bû, bi biryardarî û ewlekariya wî bû. Weke mamosteyê xwe ji jiyanê hez dikir, xwedî cesareta bilind bû, zindî bû û bi ken bû. Dema ku ez di xizmeta Dr.Şerefkendî de bûm, ez xortekî

dom» R:6

# Nêrînek li taybetmendiyên rêbertiya Dr.Seîd Şerefkendî

dom» R:5

negihîştî bûm û tijî pirsiyar li ser jiyan û nasnameya xwe ya şexsî bûm. Taybetmendiya herî balkêş ya Dr.Seîd di civîn, cejn û merasiman de ew bû ku navên kesên ku pê re diaxivî û bi navên wan digotin. Taybetmendiyên balkêş ên Dr.Seîd di hemû astan de bala mirovan dikişand û wî kiribû kesekî jêhatî di ragihandinê de û rêberekî bi hêvî yê tevgera neteweyî.

Doktor Seîd di yekemîn pêwendiya xwe ya bi ciwanan re hêza wan bi bîr anî û bi pêşniyar û şîroveyên xwe yên erênî jiyana wan reng da. Napoleon Benapard rêberan wekî “brokerên hêviyê” binav dike. Dr. hebûnên xwe yên hebûnî, serpêhatiyên xwe yên şexsî (bi şîret, perspektîv, jîr û derfetên taybet) bi hevalên xwe re parve kir. Hebûna hevalên xwe bi taybetî hevalên ciwan nirxand û wan teşwîq kir ku mezin bibin.

Doktor dûrî pozbilind, bêbawer, xeberdar, reşbîn bû, kêmasiyên hevalên xwe didît û ji rexneyên rasterast neditirsiya.

**Pabendbûna**

Di dîroka neteweyî ya kurd de rêberekî ku ne bi azwerî û ne “pabend” be û bi giştî, yê ku ne pabend be û xwe berpirsiyar nebîne, nikare bibe serok. Seîd ji bo pêşketina PDKÎ’ê di rewşeke gelekî hestiyar de weke hêzeke aktîf tê dîtin. “Tiştek bi qasî axaftinê ne hêsan e, û tiştek ji girtina peyva xwe ya roja din dijwartir nîne,” Gordon got. Di dema krîz û pirsgirêkan de yekane sedema ku mirov dikare pêş bikeve peyman e.
David McNally dibêje, “Pabendbûn dihêle hûn gava ku hûn dakevin dîsa rabin.” PDK piştî kuştina Dr. Bê guman eger pabendbûna serkirdeyên Partiya Demokrat a Kurdistanê (HDK) bi taybetî kesayeta yekem a wê partiyê nebûya, dê di rojên yekem ên piştî kuştina Qasimlo de, Partiya Demokrat lawaz û marjînal bibûya. Dr.Şerefkendî ji bo ku li ser erka rêbertiyê zêde bibe, çû asta ku canê xwe feda bike.

**Wêrekî**

Yek ji taybetmendiyên hêja yên Dr.Seîd cesaret û netirsiya wî bû. Bi rastî ne rêberî bû ku hêza wêrekiyê da Dr.Seîd, lê wêrekiya Şerefkendî bû ku ew kir rêber. “Dibe ku rêber ne xwediyê taybetmendiyên hevpar bin, lê yek taybetmendiyek wan a hevpar ew e ku rîsk bigirin,” Az got. Wêrekî nayê wê wateyê ku netirsin, lê cesaret encama kirina tiştên ku em jê ditirsin e. Zanyarê Xiristiyan Billy Graham dibêje: “Wêrek wêrek e.” Dr Şerefkendî di dema serokatiya xwe de nîşan da ku her ku bi xetereyê re rû bi rû maye zêdetir jêhatîbûn, wêrekî û xwebawerî nîşan dide.

**Baldarî**

Mifteya serkeftinê baldarî û baldarî ye. Gelek ji serkirdeyên îro yên tevgera Kurd, bi taybetî serkirdeyên Partiya Demokrata Kurdistanê (HDK) li ser mijarên duyemîn rawestiyane û guh nedane mijarên sereke yên girêdayî jiyana siyasî û serkirdayetiyê. Rêberê ku pêşîyên xwe dizane û ne baldar e, bi rastî dizane ku çi bike, lê ew çu carî nikare wiya bike ji ber ku ne baldar e. Ber çavan girtin û balkişandin du taybetmendiyên girîng ên Şerefkendî bûn û bi rastî jî sembola serkeftina wî ya di rêveberiya HDK’ê de tê dîtin.

**Dilê vekirî**

Ji bo lîderekî ji vekirîbûnê girîngtir tiştek tune ye û hemû aliyên jiyana rêberekî vedihewîne. Doktor Seîd ne tenê li ser pêşketin û serkeftina xwe difikirîn, hevalên xwe ji bo pêşketinê teşwîq dikirin û bi israr xwe wek mirovên serbixwe mezin dikirin.

**Xwedî înisiyatîf**

Taybetmendiyeke din a rêbertiya Dr.Seîd jî afirîneriya wî bû. Rêberek serketî bi rastî dizane ku ew çi dixwaze û gava hewce bike însiyatîfê digire ku wê bicîh bîne. Rêberên nûjen li benda kesên din namînin ku fersendek bidin wan da ku serdestiyê bikin.

**Dîtina erênî**

Ji bo rêberek, xwedî vîzyonek erênî pêdivîyek girîng e. Mirovên asayî li kesekî digerin ku wan motîve bike, lê mirovên serketî xwedî motîvasyon û nêrîna xwe ya erênî li ser jiyanê ne.
Vîzyon tê wateya avakirina serkeftinê. Serkeftina Doktor Seîd ne ji ber jîr û jêhatîbûna wî, lê bi dîtina wî bû. Serkirdeyekî xwedî nêrîneke lawaz dê bandorê li wêrekiya kesên derdora xwe bike û ew ê ji bo xebatê û pêşdebirina karê xwe nebin motîvasyon.
Berevajî vê yekê, rêberek ku xwedan nêrînek erênî û dilxwaziya xebatê ye, dikare îlhamê bide derdora xwe. Di bin serokatiya Dr. Seîd de, hemû organên partiyê bi awayekî berbiçav motîve bûn û xwebaweriyek ecêb li tevahiya partiyê belav bû.

**Çareseriyên pirsgirêkan**

Divê muxalefet rê li ber gihandina xeyalên xwe negire. Yek ji cûdahiyên di navbera serokên serketî û têkçûyî de hêza çareserkirina pirsgirêkan e. Di şert û mercên rêveberiya Dr.Seîd de gelek mijarên girîng li pêşberî HDK’ê bûn. Doktor Seîd ji arîşeyên partiyê yên navxwe û derva nereviya û ber bi wan ve çû û bi awayekî pragmatîk hewl da wan pirsgirêkan çareser bike.

**Ewlehiya hizrî**

Rêberên mezin di baweriyên xwe de herî kêm guman hene û ji ber vê yekê xwediyê ewlehiya rewşenbîrî ne. Serkirdeyên ku ewlehiya wan a rewşenbîrî tune ye ji bo xwe û piştgirên xwe xeternak in. Ji ber ku ew bi yên din re di aştiyê de hîs nakin û her dem digerin ku hestek ewlehiyê ji yên din bistînin. Doktor Seîd mirovek bû ku bi serkeftina hevalên xwe ronî bûbû û serkeftina takekesî wek serkeftina giştî ya partiya xwe didît. Kesê xwedî kesayetek baş û bi hêz ji hêz û serkeftina kesên derdora xwe zêdetir hêz digire û li qelskirina wan nagere.

**Disîplîna kesane**

Nivîskarê serkirdayetiyê Jackson Browne di wê baweriyê de ye: “Hêrhatina bê rêz û dîsîplîn mîna mexlûqekî heşt ling e ku li ser skateboardê dimeşe. Gelek tevger hene lê nizane bi kîjan rê ve biçe, pêş, paş, çep an rast.
Ji ber vê yekê rêberek çiqas jêhatî be jî bêyî dîsîplîn û rêzik nikare pêşde here. Yek ji taybetmendiyên herî berçav ên Dr.Seîd dîsîplîn û bernameya wî bû. Disîplîn ji bo Dr.Seîd ne pirsgirêkek demkî bû, lê taybetmendiyek jiyana wî ya şexsî û rêxistinî bû. Beşek ji niyeta xwe bi kirinên xwe eşkere kir û ne bi gotinên xwe, bang li hevalên xwe kir ku wekî wî bikin.

**xizmetkar**

Rêberên herî baş ew in ku li şûna ku ji xwe re xizmetê bikin, ji yên din re xizmetê dikin. Albert Schweitzer bi awayekî xweş dibêje: “Ez nizanim çi çarenûs li benda we ye, lê ez bawer im dê di nav we de mirovên bextewar hebin ku hînî riya xizmetê bûne. Heke hûn dixwazin bibin rêberên baş, divê hûn ji yên herî jêrîn re xizmetê bikin. çînên.
Xizmet tiştek bi rêzê re tune. Her yek ji her rêzê dikare xizmeta mirovên li dora xwe bike. Doktor Seîd hewl da ku xizmet û îmkanên pêwîst pêşkêşî organ û hevalên xwe yên partiyê bike da ku partiya xwe di her warî de pêşde bibe. Wî xwe di ser her kesî re nedidît û cesareta wî ya xizmetkirinê ew qas bilind bû ku di reftarên civakî de wekî kesek bi tevahî normal xuya dikir. Xizmeta doktor ji partiya xwe re ji hezkirin û baweriya wî ya kûr derdiket, ne ji hesta hêzê.

**Qebûlkirina pêdiviya fêrbûnê**

Doktor Seîd, wekî rêberekî serkeftî, hertim ji bo hînbûn û kamilbûnê dixebitî û qet ji rewşa “heyî” razî nebû. Meyla mezinbûn û pêşkeftinê beşek girîng a karaktera wî bû. Wî bawer kir ku roja ku wî difikirî ku ew gihîştiye potansiyela xwe ya herî zêde roja hilweşandina wî bû. Ji ber vê yekê xwendin û hînbûn bûye cewherê Dr.Seîd. Ree Crack dibêje: “Heya ku kesk in mezin dibin, lê dema ku bigihin diçirînin.” Weke rêberekî jêhatî, Dr. Seîd dizanibû ku şertê hînkirinê ew e ku em qebûl bikin ku em her tiştî nizanin. Wî ji bo ku di jiyana xwe ya siyasî û serokatiya xwe de biserkeve rêyên nû fêr bibe, kêşeyan kiribû beşek ji jiyana xwe.

**Vîsyonerî**

Perspektîfên rewşenbîrî ji bo serokekî her tişt in. Ji bo lîderekî ku ne geşbîn e, nikare rêxistinê bi pêş ve bibe û herî baş dibe sedema derketina rêxistinê. Nêrîna Dr. Seîd hişt ku ew bi zelalî armancên xwe diyar bike û li gorî wê pêşde here. Nerazîbûna ji rewşa niha yek ji wan sedeman bû ku Dr. Pêşbînî ne tiştekî ku kesek ji me re bêje, lê taybetmendiyek e ku divê di hişê mirov de be. Ger rêxistinek xwedî rêberek ne xweşbîn be, divê li kesên xwedî van taybetmendiyan bigere.

**ENCAM**

Hemû van taybetmendiyan Dr.Seîd kirin rêberekî hevdeng. Dikare astengiyên li pêşiya tevgera neteweyî û rêveberiya PDKÎ’ê ji bo pêşketina wê veguherîne derfetên zêrîn. Ev yek jî dibû sedem ku Dr. Seîd wek serokê herî metirsîdar yê opozisyona Komara Îslamî ya Îranê were dîtin, divê ji bo tunekirina fizîkî ya Dr. Seîd û bi rastî jî “perçiqandina” HDK’ê, ji bo şermezarkirina şerma siyasî û hiqûqî amade be.

## Nerîna



**“Kak Mistefa Hicrî” :**

**“Rêzdar Mistefa Hicrî: Heta ku armanca bilind ya şehîdan pêk were,Kurdistan qada şerekî dewlemende û rawestiyaye”**




**“Donald Trump”:**

**“Trump: Gotinên Harris û Biden bû sedema hewla kuştina min”**



**“Hakan Fîdan”:**

**“Em amade ne ku bi Esed re rûnin.”**




**“Joao Gallant”:**

**“ Derfeta gihiştina çareseriyeke dîplomatîk li gel Hizbullahê ber bi dawiyê ve diçe”**

# Jîna bo gelên di bin dagirkariya rêjîma Îranê re bû remza azadiya!



**N. Eskender Ceiferî**



Piştî derbasbûna du salan ji destpêka şoreşa Jînayê, gelên bindest hîn di vê xebatê de berdewam in.
Xebata mezin ya li dijî gemartirîn dîktatorê ser rûyê erdê, ji bo rizgariya yekcarî li Kurdistanê bi destên keç û jinên Kurd dest pê kir. Jîna Emînî, destpêkera vê şoreşê bû ku di asta cîhanê de weke yekemîn serhildana jinan ji bo rizgariyê tê binavkirin.

Jîna Emînî keça Kurd a xelkê Seqizê li Kurdistana Rojhilat bû. Ew di havîna sala 2022 de li bajarê Tehranê rastî êrîşa hêzên polîs ên bi nav parêzvanên exlaq ve hate girtin. Sedema girtina wê ev bû ku weke hêzên rêjîma Îranê digotin, hinek ji pora wê xuya bû û bi wî awayî jî, bingeha yasayên Îranî rastî gefê dihatin! Ew dibêjin mafên keç û jinan nîn e bê hebûna hîcabê ji malê derkevin. Lewma Jîna Emînî li wir hate girtin.

Tevî ku wê di dema girtinê de got ku ew xelkê Tehranê nîn e û ji bo serdanê hatiye wir, lê belê bi awayekî hovane li wir rastî lêdanê hat. Di encamê de jî ew ji bo heyamê çend rojan kete nav komayê.Pişt re dixtoran ragihand ku Jînayê li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest daye.

Bi belevbûna nûçeya mirina Jînayê, li Seqizê ku bajarekî parêzgeha Sine li Rojhilatê Kurdistanê ye û cihê jidayîkbûna Jînayê bû, serhildaneke mezin li dijî rêjîma Îranê dest pê kir.
Termê Jînayê ji bo wir hate veguhestin û bi hezaran welatiyan ji navçeyên cuda yên Kurdistanê berê xwe dane Seqizê.

Li wir ew bi axê hate spartin lê hizr û ramana wê ji bo rizgariyê bû destpêka şoreş û serhildanekê ku weke Serhildana Jînayê, Şoreşa Jînayê û herwisa weke Şoreşa Jin, Jiyan, Azadî jî tê binavkirin.

Mezintirîn slogan yan jî diruşma vê serhildanê heman Jin, Jiyan, Azadî ye. Partiyên Kurdî jî wê demê daxyanî dan û ji xelkê Kurdistanê xwastin ji bo nîşandana nerazîtiya xwe li hemberî siyasetên mirovkujane yên rêjîmê, bikevin gireva giştî. Xelkê Kurdistanê jî kete girevê. Ji bo heyama zêdetirî 10 rojan ti dikanek li Kurdistanê vekirî nebû.

Li wir xuya bû ku rewatiya rêjîma dagirkar li Kurdistanê çiqasî ye?!

**Bi gefxwarin, girtin û îşkenceyê jî rêjîmê nekarî xelkê Kurdistanê neçar bike ku dawî li gireva xwe ya giştî bînin. Girevek ku bi destpêşxeriya jinan li Kurdistanê dest pê kir û pişt re gihaye Erebistan (Ehwaz), Belûçistan, Azerbaycan, Luristan û nav Farsan jî.Slogana Jin, Jiyan, Azadî gelek zû bû giştgir û li hemû kolanên Îranê li dijî rêjîmê dihat hildan.**

Xelkê Kurdistanê û hemû navçeyên din jî di serhildanê de berdewam bûn û partiyên Kurdî bi daxuyaniyên xwe, ew rênimûnî dikirin.Rêjîmê di heyama 4 heyvan de zêdetirî 500 kesan li Kurdistan, Belûçistan, Azerbaycan, di nav Farsan de û li Ehwaz yan Erebistanê kuştin, Serhildêran navên wan cangoriyên azadiyê danî şehîd û soz dan ku ewê di çepera wan de bimînin.

Rêjîmê fikirî ku take rê ji bo derbasbûn ji vê rewşê, tenê ev e ku êrîşê bike ser partiyên Kurdî yên ku navendên wan li Kurdistana Başûr in. Di encama çendîn êrîşan de ji bo ser Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê PDKÎ û part û aliyên dine ye Rojilatê Kurdistanê, herî kêm 40 kes hatin şehîdkirin ku biçûktirînê wan, zaroka zikê diya xwe de bû.

Vanyar navê wî bû ku di zikê diya xwe de bû. Di encama vê êrîşa bi mûşekan de diya wî birîndar bû ji bo nexweşxaneya bajarê Koyê hate veguhestin, li wir diya wî jiyana xwe ji dest da. Ew ji dayîk bû û piştî rojekê ew jî tevlî karwanê cangoriyên şoreşa Jînayê bû.
Hevdem li navxwe jî bi hezaran kes ji aliyê rêjîma Îranê ve hatin girtin. Her û her ew serhildan gurtir dibû û li dervey welat jî rêjîma Îranê hewl da dirşm yan jî sloganeke mêrsalarî bi navê Mêr, Welat, Avedanî çê bike.

Piştî ku ew slogan li hin ciyan li Ewropa û Amêrîkayê di nav xwepêşandanên ji bo piştevaniya serhildana Jînayê de hatin hildan, û Riza Pehlewî kurê dîktatorê berê jî hewl da bêje ku ew rêberê vê serhildanê ye û ev serhildan ne serhildana jinan e, lê belê serhildaneke Îranî û nasyonalîstî ye, xelkê navxwe hinek sist bû. Ji ber ku xelk ne sîstêmeke mêrsalar û ne jî nasyonalêstî dixwaze.

Tevî ku niha piştî du salan serhildan hinek sist bûye û xwepêşandanên navxwe weke berê nemane, lê belê li navçeyên cuda bi awayên ciyawaz, şoreş li dijî rêjîma Îranê berdewam dike.



# Kurdistan hertim zindî ye



N. Hesen Mukerem



Dîroka neteweya kurd pire li serkeftinên mezin û bi lehengên cesûr re,, beriya peymannameya Sykspco û Lozanê ku di navbera Birîtaniya û Firansa de hate îmze kirin û Kurdistan bi ser du parçan de piştire bi ser çar parçan de hate veqetandin, kurd pir bihêz û xwedî bandor bûn li wî serdemî de, lê herçawan Bêşikçî dibêje kurd paramayê aqilê xwe yê olî ne, ji ber ku gelê kurd zêdetir girêdayî ola xwe ne û her vê yekê derbên pir mezin li dewletbûna Kurdan daye.

Axaftinên Mustafa Kemal Ataturk ên di kongreya Erzirom û Sêwasê ya sala 1919an de cihê balkêşiyê bûn, dema gotibû "Îslam bindest e", ango Îslam û xelîfe di rewşa cîhana nû de bindest in û divê em wan rizgar bikin. Axaftina balkêş a Ataturk bandorek mezin li ser Kurdan kir, nemaze ku Kurd bi xwezayî olî ne û bi bawerî û nirxên xwe yên olî ve girêdayî ne.

Wek mînak, Şerîfê Mekkê ji bo rizgarbûna ji Osmaniyan bi Îngilîzan re hevkarî kir. Lê Şêx Mehmûd di bin bandora gotinên Ataturk de maye û dîtiye ku Îslam û Xelîfe di bin destê Îngilîzan de ne û divê em wan ji Îngilîzan rizgar bikin, bi vê jî xwastin Kurd li hember Îngilîzan derkevin! Loma jî ev kêmasiya Kurdan berdewam kir heta ku Lozan hat îmzekirin û Kurdistan dîsa hat parçekirin.

Ev rastiyeke ku kurd hertim dikeve dava dagîrkeran û olê beriya netewebûna xwe dihesibîne û ev yek jî dibe sebeba derbe xwakirina kurdan ji aliyê dagîrkerên Kurdistanê ve.

Heta di şerê di navbera Îsraîl û Erebên Xezeyê de jî dîsan Kurdên herçar parçên Kurdistanê ku bi xwe bindestin û di bin şorê zordestî û dagîrkeriyê de dinalin xem ji Xezeyê dixwarin û silogan bo piştgîriya Xexeyê didan.

Tevî van hemû xapandinan û parçekirina Kurdistanê û çêkirina sînûrên destkirid. bi destên mezin hêzan û dagîrkerên Kurdistanê ku hemû hewl û têkoşîna dijminan kipkirina gelîê Kurd bû.

Û dagîrkerên Kurdistanê jî bi çêkirina kirina sînûrên destkird Kurdan wek sînûrparêz yan bi gitina Farsan sînûrvanên xeyûr bihesibîbin lê Kurdan bi meşandina xebata dûr û dirêj û berdwam a xwe û di dijwartirîn rewşan û tarîtiyan de ku gelek caran dagîrkarên Kurdistanê di axavtinên xwe de behsa nemana Kurdistanê û tiştek bi navê xaka Kurdistanê dikirin lê piraniya Kurdan û bi taybet Kurdên Rojhilatê Kurdistanê û hîn di bin serdestiya rejîma Îranê ne niha hişyar bûne.

Serkeftin û armancên Kurdan wek barîna dilopên baranê li ser erdê hişk û rengînbûna deşt û newalan bi bihorîna demê yek bi yek ev têkoşîn û xwîndan digihîjin armancan û xewnên gelê Kurd dibin rastî. Niha Kurdistana Başûr piştî evqas enfal û şehîd danan niha parçeyeke azade û parça Rojava jî piştî şerê li dijî DAÎŞê heta qasekê xwe bi rê ve dibe û bûye navenda rikeberiya mezin hêzên cîhanê ji bo piştgîriya van ji Kurdan re.

Di hefteyên borî de Sergey Lavrov Wezîrê Derve yê Rûsya li rêkevta 02.09.2024an de bangî Kurdên Rojava kir ku pişta xwe bi Amerîkayê re germ nekin û em bi Tirkiyê re di diyalogê de ne Tirkiye razîbûye ku li Sûriye vekêşe. niha mezin hêzên cîhanê jî dizanin ku hewceye Kurdistan bibe dewlet.

Û parça Rojhilat jî piştî borîna demek dirêj bêdengî û şehîdkirina du rêberên zana û xwedî bandor yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi navên şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlû û şehîd Dr. Seîd Şerefkendî bi destên rejîma terorîstperwer a Îranê û bûna xebatekî rijd, navûdengê Kurd li Rojhilat heta destpêkirina xebata Şar û Şax zindîtir bû û her roj keç û xortên Kurd tevlî refên hêza pêşmerge bûn û xelkê navxwe jî bi hemû şiyana xwe û di hemî deman û hilkeftan de tevahiya bajarên Kurdistanê bihevre bi grev û derketina ser şeqaman carek din dengê Kurdan li Rojhilatê Kurdistanê zindî kirin.

Heta di serhilana şoreşgirî ya Jîna Emînî bi silogana Jin, Jiyan, Azadî de, rejîma serkutker û dagîrkerê Kurdistanê heta ser lêva kendalê herifînê birin û li bajarên netewên dinê de jî di xwenîşandanên xwe de gazî hêza pêşmerge dikirin û digotin Kurdistan tenê nine.

Niha serkevtin, hişyarî û zindîbûna gelê Kurdan wek dilopên baranê dibarin diyar in, ji bo mînak di duyemîn salroja şehîdkirina Jîna Emînî û serhildana şoreşgerî ya Jin, Jiyan, Azadî de li Rojhilatê Kurdistanê bi daxistina bazar û dukanan bi hevre girev girtin û hemû xebatên xwe yên rojane yên jiyanê bona rêzgirtin ji şehîdên vê şoreşê û vebîranîna xwîna şehîdên vê şoreşê û zindîbûna gelê Kurd li hember serkutkarî û dagîrkariya rejîma Îranê, rawestandin û wek salên borî ev yekîtî û niştîmanperweriya xwe dubare kirin.

Ya ku dibêjin jiyan û xebata şoreşgerî, tabloyeke rengîn e, ku bi rengên xweşik yên serkevtinan ve hatiye neqişandin pir rast e... raste gelê Kurd pir ewraz û nişîw bihorandin e û jiyanek pir qorbanîdan derbaskiriye lê niha rûpeleke nû vekiriye .

# Xebat



**Sîmîn Rûhanîzade**

Xebat ev peyva ye ku li dîtingeha her mirovekê xwe bi awayekê nîşan dide û rêyên cuda hene bo xebat kirinê.

Li gor berçavgirtina rewşa Kurd bitaybet li Rojhilatê Kurdistanê, niha rehendên cuda hene ku take Kurd ji wan rehenda ve têkoşînê bike û bo hebûn û neteweya xwe têbikoşe.
Renge di heyama salên derbasbûyî de derfet û Meydan ji bo cerbandin û xwe nîşandan di rehendên cuda yên xebat li Rojhialtê Kurdistanê de mîna niha berfireh neba û mirovê Kurd tenê amadebûn di çalakiyên çekdarî de, xebat û têkoşîn hesab kiriba.

Lê belê wirda hewceye ku îşare bi vê hevoka destpêkê bikim ku min got xebatn li dîtingeha her mirovekê cuda ye, ber hindê di niha de nêrîn û dîtingehên cuda ji bo mifah wergirtin ji rehend û şêwazên cuda yên xebatkirin li Kurdistan ê de heye.

Ji bo mînak komek kes pêdagirin ku dive di niha de mifah ji xebata cemawerî û rêkxistinên berfireh bê wergirtin û ji vê rê ve tevahiya qad û texên civaka Kurdewarî di xebat û têkoşînê de beşdarî bikin û hemû bihevre li hember hêza dagîrker û dîktator rawest in. di aliyek din ve jî hinek kes li ser vê dîtingehê pêdagirin ku tenê rêya rizgariya Kurd li dest dagîrkerên Kurdistanê xebata çekdarî û çeka li ser mile pêşmerge ye.

Hebûna wan herdu dîtingehan heta niha tiştek asayî û hişmendiye, yak u şaş e ev yeka ye ku xwediyên wan dîtingeh û hizran wek tişteke negur û reha beraxwe bidin bi hizr û dîtingehên xwe, ji bo mînak yê ku wisa dizane çeka pêşmerge rizgarkera me ye, bawerî bi hêza cemawerî û rêkxistinîê tunebe û berevajî vê,ya ku bawerî bi hêza cemawerî hebe bawerî bi hêza çekdarî tunebe.

Herwisa mfahwergirtin ji herdu rehendan bi bê lêkolîn û li berçavgirtina rewş û şiyana hêza xwe û bi şaştî mfahwergirtin li yek ji van dibe ku te heta nêzî jinavçûnê bibe û te li lîstik û dorhêla siyasî dûr bixe û şikestê bixweyî û tevgera te tûşî rawestanê bike.
Herwisa vêdabirin û qutkirina yek ji van herdu rehendan jî di rewta xebat û têkoşînê de bitaybet xebata partiyek siyasî ku xwediyê pêgeh û alîgirên pir e ku her takekê jî dîtingehek cuda heye dibe sebeba derbe lêdanek bihêz.

Her ji ber vê yekê ye ku xesarnasî û şirovekirina rewş û rastbînî û xwe dûr ragirtin ji xeyal û nemimkinan û dana biryarek şoreşgirane û bi qezenc, rêya xebatê xweş dike û nake girêpûç di nav destên te de.
Di niha de û digel rewşa niha ya navxweyî welat û ev givaşên ku li ser partiyên Kurdî heye, ji dîtingeha min ve rehenda xebata cemawerî û rêkxistina hêza gel dikare rêya xebatê ji bo me hêsan bike.
Berê me digot ji bilî çiyayan ti hevalek me nîne, lê niha weke taktîkeke stratejîk û hişmendiya rewşê em dikarin vê yekê biguherin û bêjin ji bilî şeqaman ti hevalek me nîne.
Niha pirsiyarek tê holê çima şeqam ? û gelo xebata çiya tê red kirin?

Di bersiv de dibêjim mîna ku em hemû dizanin û me dît ku du salan beriya niha û di serhildana Jin, jiyan,Azadiyê de çawa şeqaman desthilata 40 sale û dîktator a Îranê hejand û heya ser lêva gorê bir û gotara şeqam hêza xwe nîşan da û dengê neteweya Kurd û neteweyên din yên li Îranê gihandn guhê tavahiya cihanê û çepereke serkevtî bû ji bo xebata niha.

Îca her ji ver vê yekê ye ku dive ji vê ezmûna serkevtî mifahê werigrin û di niha de xebata cemawerî û rêkxistina gel û bihêzkirina potansiyela şeqam bikin pêşengê




xebata xwe û em bixwe çepera xebatê hilbijêrên û bi berçavgirtina ev rewşa ku heye rê nedin dujminên me meydana xebatê ji bo me hilbijûre û me bêxe nav meydana şerekê ku de ev bixwe li nav de baladest û bi hêze û çawa ku xwe hez dikin şerê nemanê digel me bikin.
Belkû dive em bitaybet aliyên siyasî û partiyên kurdî bin, ku dijmin bikişînin nav meydanan ku di nav de lawaze û nikare di vî şer û çeperê de serkewtî be.
Ji bo mînak desthilata Koamra Îslamî bi hemû hêz û deng û fengê xwe ve di xebata ser şeqam û rêkxistina cemawerî û yekgirtina me de nekariye serkevtî be û tirsiyaye û şikest xwariye.

Her ji ver vê yekê ye divê di vê demê de û ezmûn wergirtin li hêza şeqam , kolana û şeqamên gundan û bajarên Kurdistanê bikin bi meydana xebat û herwisa sembola berxwedana li dijî dagîrker.

Û di vê demê de bi xurtkirina vê rehendê ji xebatê li hember dagîrker derkevin. û niha ku rejîma Îranê bi başî dijminê xwe û hêza piştewaniya gel ku , şeqam û partiyên Kurdistanê ne nas kiriye û givaş xistin li ser wan û bi sînûrdarkirina çalakiyên partiyan li Başûrê Kurdistanl hewl didin xelkê û partiyan ji hev dûr bixin, ber hindê baştirîn rê bo partiyan ev ye ku bi rêkxistina gel li navxwey û bihêzkrina gotara şeqam, givaşê bixe ser rejîmê û carek din nîşan bide ku pêge û çepera partiyên Kurdî û bitaybet Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, bajar û gundên Rojhialtê Kurdistanê ye û şeqamên me baskên ramalîna dagîrkerên Kurdistanê ye.

Herwisa bersiwa pirsa jorê ku gelo xebat çiya red dikin? dive bibêjin ku rehenda xebata çekdarî û hêza pêşmerge û çiya di dîroka Kurd û Kurdistanê de serkevtin û dîrokek pir li şanazî tomar kiriye û bi dehan hezar carî Kurdistan li êrîşên dirindane yên dagîrker parastiye û pîlanên dujmin pûç kiriye û Kurdistan ku çiqê nav çavên dijminan e û bi sebeba hebûna pêşmerge Kurdistan mayem ji ber vê nabe vê rehenda girîng û pîroz em li berçav negirin, û hêza pêşmerge herdem baska gel û hêz û hêviya nîştiman bûye.

Lê her çawa ku min berê behs kir dive rewş bê naskirin û xesarnasî bê kirin û bizanibî ku di vê rewşê de kîjan yek ji van her du rehendan dikare serkevtina te misoger bike, û herwisa nabe ev yekê ji bîr bikin ku here yek ji wan herdu rehendên xebatê nabe di çarçoveya têkoşîna me de bê qutkirin belkû pêka rewşê mifahê ji wan rehenda werbigirîn û rêya xebata xwe nas bikin.

Di dawiyê de cihê behskirinê ye,ev gotare ku behs ji rehendên xebatê dike di salroja terorkirina rêberê şehîd Dr. Sadiq Şerefkendî de hatiye nivîsîn her ji ber vê yekê bi gotinek wî nemirî dawî bi gotara xwe dînim ku dibêje : Ji bo xebatê çi zêdeye? rê...

# Ew dersên ku Kurd pêdivîye li şoreşa “Jin, Jiyan, Azadî” werbigrin



N. Elî Munezemî



Bizava “Jin, Jiyan, Azadî” ku piştî şehîdbûna Jîna Emînî di 16 Îlona 2022an de li Rojhilatê Kurdistanê serî hilda û piştre pelên xwe avêtin bo hemû aliyên Îranê, bizaveke bêhempa bû ku bo yekimîn car di temenê Komara Îslamî de bi wê berfirehiyê û naverokê bi dijî wê rejîma tûtalîter û dijî mirovî çêbû.

Armancên wê şoreşê ku di slogana “jin, Jiyan, Azadî” de reng vedabû, li karakterên kesayetiya Jîna Emînî ve hatibîn wergirtin. Li berk u Jîna kurd bû, jin bû û astengiyên ser rêya jiyana wê bi sedema Kurdistanîbûnê bû.

Bi wê wateyê ku ew li hêlekê di bin zilma neteweyî, zayindî û çînayetî de bû û li hêla din jî di bindestiya pergalek tûtalîter de hemû azadiya xwe ya takekesî û sîyasî jî bêpar mabû.

Li ber hindê jî şehîdbûna wê zû bala xelkê li her derê kişande ser xwe û xelkê di yek yan çend li wan zilman de, xwe bi Jîna ê re hevpar dizanîn û dûr nedizanîn ku rojeyê çarenivîsa Jîna ê bibe çarenivîsa yêkek li endamên malbata wan bi xwe jî.

Li ber hindê jî her di merasima binaxkirina Jînaê de hate gotin ku «Jîna dikarî keça her yek ji me be” û ew gotinê xelk hejand û ew li xevek giran hişar kirin.

Her li destpêka şoreşê de derket ku Rojhilata Kurdistan li qada siyasî de bêhtir û baştir li hemû neteweyên din yên bindestê Îranê de hatine organize kirin û xwediyê potansîyela serhildanê li dijî rejîma Îranê ne.

Li ber hindê jî rejîmê zû cehd kir ku li rêya hindek mohreyên xwe di nava opozîsiyonê de, yekbûna kurdan bike armanc û nehêle yekbûna netewî di Kurdistanê de berdewam be.

Ewan bi pîlan aliyek sîyasî di Kurdistanê de kişandin bo nav leyîstokên xwe ku li aliyê dezgehên ewlekarî yên Îranê û opozisyona navendgera ve hatibûn pîlan kirin û bi wê yekê jî yeketiya netewî di Rojhilatê de tûşî astengiyê kirin.

Bo neteweya serdest li Îranê de tenê azadiya siyasî û takekesî armanc e. Li berk u ew wek Kurdan rastî zilma netewî nabin û kêmtir li kurdan jî zilma cînayetî li wan tê kirin.

Li ber hindê jî her çend ku li destpêka şoreşê de ewan hindek hewsozî bi kurdan re nîşan dan, lê li dema daviyê de ku kurd li qadan dihatin kuştin, ewan tenê li pişt pencereyan slogan didan û hazir nebûn rîskê bikin.

Partiyên sîyasî yên Rojhilata Kurdistanê jî kêmasiyên mezin li xwe nîşan dan di wê şoreşê de. Rêberiya wan partiyan nekarîn zû xwendinek drûst li wê şoreşê bikin û piştre jî nekarîn li qada dîplomatîk de çalakiyên layiqê wê şoreşê hebin. Xwîna kurdan hate rijandin û bû derfet bo xelat û beratan bo hindek kes li neteweya serdest ku nirxek ne bo şoreşê û ne jî bo neteweya Jîna Emînî dabûn.
Şoreşa Jîna her wisa bû sedema paşekişe bi rejîmê derheq pirsa hicabê û hindek normên ku rejîmê pêştir li civakê de li ser jinan de sepandibûn, hatin şikandin. Ew şoreş her wisa bû sedem ku hindek mohre û xwefiroş li dema xurtbûna şoreşê de, daxûyaniyan bidin û wek rastî yan taktîk bihorîya xwe rexne bikin û bêjin ku êdî tewî rejîmê nabin.

Şoreşa Jîna bû sedemê çêbûna wêjek xasmanî li dîroka xebata neteweya kurd û neteweyên bindestê Îranê de û karî bala cîhanê bikşîne ser wê şoreşê. Ewê her wisa dîroka Îranê û Kurdistanê li ser du qonaxên pêş û paş wê şoreşê parve kiriye.

Yanî ne Îran dikare bizivire bo serdema pêş wê şoreşê û ne şoreşa kurdan dikare wek serdemên pêş wê şoreşê xebat û siyasetê bike.

Şoreşa Jînaê carek din da eyankirin ku eger em pirsa Kurdistanê wek xwe nebînin û her di çarçoveya Îranê de û wek pirsek navxweyê Îranê dûreçonê bo bikin, yê tenê zirar li me bimîne û hemû qazancê wê yê here berîka neteweya serdest.

Li ber hindê jî hevceye ku ew pirsa xwe wek pirsek netewî û Kurdistanî bibînin. Hingê ew yek yê bibe sedem ku zirar û qazancê wê bo me bi xwe bin. Şoreşa Jîna kapasîteya Kurdistanê bo rolgêran di xebatê de da ber çavan.

Ew kapasîteya çawa em dibe mifahê jê werbigrin, dibe partiyên siyasî li asteke wek hev de, bêyî ku yek ji wan rolek mezintir bo xwe heq bizane, bikarin bi plan û bernameyek hevpar dora hev kom bin û tenê bi armanca rizgariya welat û netewe, yekgirtî xebatê bo pêşve bibin.

Hemû aliyek dibe armancên din bihêlin bo piştî azadiyê û îstiqrara sîstema sîyasî di Rojhilatê de.



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Endamekî Hizba Dêmokrat, ji aliyê Asayîş a Hikûmeta Herêma Kurdistanê ve radestî rêjîma Îranê hate kirine



Li heyama 2 heftiyên derbasbûyî de "Bêhzad Xusrewî", xelkê bajarê Seqizê û endamê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, rûniştiyê bajarê Silêmaniyê, ji aliyê dezgeha Asayîş a Hikûmeta Herêmê li wî bajarî de 2 car hatiye gazîkirin û cara duyemê û piştî çend rojan binçavkirin û ragirtinê, radestî îdareya îtilaat a bajarê Sinê kirine.
Li daxuyaniya dezgeha Asayîşa Herêmê li bajarê Silêmaniyê de sedema binçavkirina û radestkirina "Bêhzad Xusrewî" bi komara îslamî bo vê yêkê vedigerînin ku navbirî derfetnameya niştecîbûn li Herêma Kurdistanê de nebûye û ti pêwendiyeke teşkîlatî bi ti aliyeke siyasî ve nebûye.
Berwajiyê eva ku li daxuytaniya dezgeha Asayîşê de hatiye, Bêhzad Xusrewî, zêdetir ji 10 sal e ku digel dayîk û xwîşka xwe li Herêma Kurdistanê li bajarê Silêmaniyê de dijî û pêka hemû belgeyên berdest, li nîşîngeha bajarê Silêmaniyê de derfetnameya man û niştecîbûnê wergirtine û mana wan li wî bajarî de yasayî û pêka rênimûniyên Hikûmeta Herêmê bûye û heta wek penaxwazê siyasî li komîsariyaya bilind a penaberan a nûneratiya "UN" li Herêma Kurdistanê navê wan hatiye tomarkirin û herwisa heyamê 7 sal e ku ew û malbata wî endamên Hizba Dêmokrat Kurdistana Îranê bûne û li tevahiya wî heyamî de li çarçoveya yasa û rênimûniyên hikûmeta Herêmê li bajarê Silêmaniyê de jiyane û ti rêderketin û serpêçiyek ji navbirî nehatiye kirin ku li dadgehê de bi ser de hatinbe selimandin.
Hizba Dêmokrat a Kurdiatana Îranê, radestkiriuna "Bêhzad Xusrewî" bi komara Îslamiya Îranê, şermezar û mehkûm dike û radigehîne ku dosyeya girtina Bêhzad Xusrewî dibiya pêka yasa li Dezgeha Dad a Herêma Kurdistanê de biryar li ser hatiba dan, neku navbirî ku endamê hizbeke siyasî ya dijberî komara îslamî û penaxwazekî siyasî yê rûniştiyê Herêma Kurdistanê ji aliyê dezgeha Asayîş a Silêmaniyê ve radestî komara îslamî ya Îranê kiraba. Lewma tevî nîşandana nerizayetiya xwe ji vê bûyerê, em daxwaza zanyarî û rohnkirinên zêdetir ji aliyê navendên pêwedîdar û herwisa lipeyketina yasayî bo vê mijarê dikin.

---

## Rêjîma Îranê 5 welatiyên xelkê bajarê Dîwanderê, binçav kirin



Rêjîma Îranê li roja derbasbûyî de 5 welatiyên xelkê bajarê Dîwanderê bê belgeya yasayî û bi tundûtîjî li malê wan de binçav kirin.
Pêka rapora "Çaw News"ê, sibêdeha roja Yekşemî 18ê Xermananê, 4 welatiyên xelkê bajarê Dîwanderê yên bi navên "Mihemed Emînî, Newîd Şerîfî, Ferhad Qemerî û Fuad Muradî û Mozefer darayî" ji aliyê hêzên dije mirov ên îtilaata spaha pasdaran a terorîst ve hatine binçavkirin û bo ciheke nexuya hatine veguhastin.
Pêka vê raporê hêzên îtilaat a spaha psadaran a terorîst, bê belgeya yasayî êrîş kirine ser mala wan welatiyan û bi tundûtîjî, ew binçav kirine.
"Mihemed Emînî û Newîd Şerîfî" xelkê gundê "Kanî Sipî" û Ferhad Qemerî" xelkê gundê "Kutik" û Fuad Muradî xelkê gundê "Kêlekebûd"ê ser bi bajarê Dîwanderê ne.
Hêzên hov û dije mirove ên ewlehî yên rêjîma Îranê li devedevê duyemîn salvegera şehîdkirina "Jîna Emînî"yê dest avîtine binçavkirina bi kom a xelkê li bajarên Rojhilatê Kurdistanê.
Heta belavbûna vê nûçeyê, ti zanyariyek li derheq sedema binçavkirin, tohmetên sepandî û cihê ragirtina wan welatiyan, li ber dest nîne

---

## Ji destpêka şoreşa Jînayê ve heta niha rêjîma Îranê zêdetir ji hezar û 400 kesî bidar vekiriye




Rêjîma Îranê ji destpêka şoreşa Jînayê ve heta niha, zêdetir ji hezar û 400 kes bidar vekirine ku piraniya wan bidarvekirinan bi biryara dadgeha înqilab a rêjîmê bûye.
Saziya Mafê Mirove Îranê bi belavkirna raporekê daye zanîn ku rêjîma Îranê ji destpêka şoreşa Jînayê ve hgeta niha zêdetir ji hezar û 425 kes bidar vekirine û piraniya wan bidarvewkirinan bi biryara dadgeha inqilab a rêjîma Îranê bûye.
Vê saziyê li derheq zêdebûna nêzî 2 qatî ya rêjeya bidarvekirinan li Îranê huşdarî daye û daxwaz ji cîvaka cîhanî û navendên mafê mirovî kiriye ku bi lezgînî vê yekê berçav bigrin ku rêjîma Îranê, bidarvekeirinê wek alaveke tepeserkirinê bi kar tîne.
Herwisa berdevkê vê saziyê "Mehmûd Amîrî", ragihand: "Bidarvekirin girîngtrîn alava rêjîma Îranê bo çêkirina tirsê li nava civakê û bi armanca tepeseriya neraziyan û rêgirî ji serhildanê ye. girtiyên bi tohmetên pêwendîdar bi madên hişber ku bê dadgehêkirineke dadperwerane têne bidarvekirin, qurbaniyê kêm xerc ên maşîna kuştin a rêjîmê ne.
Vê saziyê daxwaz ji civaka cîhanî û bi taybet Komîteya Peydakirina Rastiyan a Saziya Netwên Yekgirtî kiriye ku li bikaranîna sizaya bidarvekirinê wek beşek ji cinayetên pêwendîdar bi tepeseriya nerizayetiyên şoreşa "Jin Jiyan Azadî"yê lêkolînan bikin.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (478)